

**Rewşa Ziman û
Perwerdehiya
Kurdî li Tirkîyeyê**



Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî

Rewşa Ziman û Perwerdehiya Kurdî li Tirkîyeyê

Omer FÎDAN

Amed, Cotmeh 2020

**ÇAVDÊRIYA MAFÊN
ZIMANÎ Û ÇANDÎ**

Rewşa Ziman û Perwerdehiya Kurdî li Tirkîyeyê

Amed, Cotmeh 2020

Nivîskar:

Omer Fîdan

Edîtor:

Ulaş Güldiken

Mîjanpaj:

Zafer Tüzün

Tora Ziman û Çanda Kurdî

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E
Kayapınar - Diyarbakır

Web: www.torakurdi.org

E-mail: info@torakurdi.org

Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berê Her Tîştî Zarok berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

Naverok

<i>Kurte</i>	6
<i>Destpêk</i>	7
Armanç û Rêbaz	8
Girîngiya Ziman û Perwerdehiyê	9
Pirsgirêkên Sereke yê Qadên Ziman û Perwerdehiya Kurdî	10
Çend Mînakên Binpêkirina Mafên Zimanî	14
Pêşniyazên Çareseriyê	16
<i>Wek Encam</i>	19

Kurte

Ev rapora li ber destên we bi çavdêriya li ser mafên zimanê û çandî ya di qadên Kurdî û perwerdehiya Kurdî de hatiye amadekirin. Her wekî hemû qadên din ên jiyane, di van qadan de jî tê dîtin ku bînpêkirina gelek mafan pêk hatiye û bi tunehesibandina van mafan xebatên di van qadan de her roj hinekî din dikevin nava xetereyê. Ev rapor di encama wan civîn, hevdîtin û hevpeyvînên nivîskî de hatiye amadekirin ku di van qadan de pispor in û xebatên xwe bi awayekî takekesî an jî di bin banê saziyan de didomînin. Her çiqas çavkaniya sedemên piraniya kêşe û arîşeyên van qadan jî polîtîka, sekn û helwestên serdestan be jî, ji ber ku kes û saziyên di van qadan de dixebitin kêm in, têkiliyên di navbera wan de lawaz in û xebatên ku dikin nikarin bigihînin gel û berbelav bikin, pîrsgirêkên van qadan her roj hinekî din zêde dibin û barê li ser milê xwebexş û xîretkêşên van qadan jî her roj hinekî din girantir dibe. Ev kêşe dikare bi wê yekê bê çareserkerin ku perwerdehiyeke berbelav bi wî zimanê bê çêkerin.

Destpêk¹

UNESCO dibêje ku her zarok dikare û divê bi sê zimanan perwerdehî bi-bîne yan jî sê zimanan hîn bibe û piştgiriya dide pergaleke perwerdehiyê ya bi vî awayî: Zimanê xwe yê dayikê, zimanê herêmiyan neteweyî û zimanekî navneteweyî. Berevajî vê biryara UNESCOyê ya ku di sala 1999an de daye, Tirkîye bi îsrar perwerdehiyê yekzimanî û yekrengî didomîne. Ev hişmendiya perwerdehiya formal a ku li Tirkîyeyê tê sepandin, dike ku zarokên ne Tirk li derveyê pergala heyî ya li Tirkîyeyê bimînin an jî ji zimanê xwe yê dayikê û çanda xwe qut bibin, di nava çerxa bişaftinê de bimehin. Her çî qas di serî de lêkolînên ku UNESCOyê kirine û li gor hemû xebatên zanistî kesên ku bi zimanê xwe yê dayikê perwerde bibin zêdetir serkeftî dibin jî, perwerdehiya formal a li Tirkîyeyê bi armanca bişaftina gel, ziman û çandên din, bi awayekî yekreng hîn jî tê sepandin. Tirkîye her çî qas ji 2004an ve bûbe berendameke fermî ya Yekîtiya Ewropayê û divê hevî û daxwazên ku jê bînin kirin bi cih bîne û bibe palpişt û piştgireke peymanên Yekîtiya Ewropayê jî, Tirkîye bi îsrar li ber xwe dide û di qada perwerdehiya bi Kurdî de tu gavan navêje. Di rapora Tirkîyeyê ya 2019an de tê gotin ku “Di mijarên perwerdehî û çandê de Tirkîye *di hinek waran de amade ye.*”² Lê bêguman bi hûrgilî nayê gotin ku ev qadên ku amade ne û qadên ku ne amade ne kîjan in û qet behsa perwerdehiya bi zimanê dayikê yan jî Kurdî nayê kirin.

1 Ji bo ku di rewşeke awarte ya giştî de û di demeke kin de em bikarin vê raporê amade bikin gelek kesan xwe dan ber bar û bûn alîkar. Ji bo alîkarî û piştgiriya wan, di serî de Dr. Cuma Çiçek, Mehmet Alî Ertaş û Rıza Polat, mala hemû xebatkar, dildar û xwebexşên ziman û perwerdehiya Kurdî dîsa û her ava be.

2 Avrupa Komisyonu, *2019 Türkiye Raporu* (Bruksel: Avrupa Komisyonu, 29.05.2019).

Armanç û Rêbaz

Di nava vê heytehol û kefteleftê de ya ku kurd tê de hatine dorpêçkirin, ji bo destnîşankirin, tomarkirin û rêlêgirtina kêmasî û xetereyên li ser ziman û çanda Kurdî, Komeleya Berî Her Tiştî Zarok bi hevkarîya Tora Ziman û Çanda Kurdî di çarçoveya *Projeya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî* de şeş raporên tematik li ser mafên zimanî amade dike ku yek ji wan raporên ev rapora li ber destên we ye.

Armanca projeyê ew e ku:

- Hişyariyeke navxweyî ya xwedîderketina li ziman û çanda xwe di nava gelê kurd de bê afirandin, geşkirin,
- Bi xebatên wek rapirsîn, amadekirina raporên, civînên bi mijarên taybet, kargeh, semîner, konferans, di lêkolînên qadî yên giştî û qadên xwereng û xweser de arîşe bî destnîşankirin,
- Rê û rêbazên çareserkerina wan werin dîtin û sepandin,
- Tevahiya cîhanê bi xetereya ku ziman û çanda Kurdî tê de ye bide hesandin,
- Di çarçoveya peyman û daxuyanîyên navneteweyî de yên derbarê mafên zimanî û çandî de pêşengiya doza ziman û çandî ya rewa bike,
- Bang li alîgir û piştvanên van daxuyanî û peymanan bike da ku piştgiyariya vê doza rewa ya gelê kurd bikin, xwedî lê derkevin û helbet dilopeke biçûk be jî li *bîra zimanî û çandî* ya gelê kurd bê zêdekirin.

Ji bo çavdêrîkirin û raporkirina bînpêkirinên mafên mirovî yên heyî yên li Tirkiyeyê yên di qadên ziman û perwerdehiyê de, bibîrxistina peywîrên saziyên neteweyî û navneteweyî yên ku divê van bînpêkirinan bişopînin û rapor bikin û ji bo ku daneheveke qadî û rêbazên xebatê yên bi vî awayî werin diyarkirin, ev rapor hatiye amadekirin. Rapor di encama du civînên fokûskirî yên li ser ziman û perwerdehiyê de û bi lêkolîn û hevpeyvînên rû bi rû yên qadî hatiye amadekirin. Ji ber rewşa pandemiye, ev civînên bi mijarên taybet li ser înternetê hatin kirin. Berî civînê derbarê rojev û mijarên civînê de bi awayekî nivîskî beşdar hatibûn agahdarkirin. Bi temamî 26 kes beşdarî civînan bûn.³ Beşdarên van civînan ev kes bûn ku ev demeke dirêj e li ser ziman û perwerdehiyê hem bi awayekî takekesî û hem jî di bin banên saziyên wek komele, weqf, enstîtu û zanîngehan de xebatan dikin, xwedî ezmûn û zanînen girîng in.

³ Civîna Yekemîn: 18.06.2020, bi beşdariya 14 kesan, li ser bernameya ZOOMê; Civîna Duyemîn: 15.16.08.2020, bi beşdariya 12 kesan, li ser bernameya ZOOMê.

Her çî qas heta niha di warê ziman û perwerdehiyê de gelek xebat hatîbin kirin, gelek sazî hatîbin damezirandin û gelek kes hatîbin gihandin jî, sazî yan jî beşên saziyan ên tomarkirin û arşîvkirinê tune ne, bîreke tekûz a xebatên qadî tune ye. Li gel ew qas ked, xebat û xwebexşiyên mezin jî di warên ziman û perwerdehiyê de rabirdû xumamî ye. Bîreke zindî ya kolektîf bi civînên bi vî rengî, bi parvekirinên berawirdî dikare ava bibe û bi xebat û raporên bi vî rengî jî dîroka veşartî li ber çavên tevahiya cîhanê robike.

Girîngiya Ziman û Perwerdehiyê

Feylesofê Viyanayî Ludwig Wittgenstein (1889 - 1951) ku gelek tişt li *felsefeya* zimanê zêde kirine, dibêje, “Sînorên zimanê min sînorên cîhana min in. Heta ku dewlemendiya wateyî û kûrahiya wateyî ya zimên bi pêş nekeve, karên ku bi wî zimanê werin kirin dê sînorkirî bin.” Hêmayên zimanê çî qas dewlemend bin, hêza ramanî jî ew qas xurt dibe; behremendiya axaftin û nivîsînê ew qas xurt dibe; serkeftin û karên ku dikarin bînin kirin ew qas zêde dibin; berhemên ku dikarin werin afirandin ew qas zêde dibin. Ludwig Wittgenstein di pêşgotina berhema xwe ya bi navê *Tractatus Logico - Philosophicus* de (1921) dibêje, “Tevahiya pirsgirêkên felsefî dikarin bi lêkolînên zimanê werin çareserkin.”

Di Berfenbara sala 1948an de, ji aliyê Lijneya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve *Peymana Astengkirin û Cezakirina Nijadkujiyê* (The Convention on the Prevention and Punishment of the Crime of Genocide) tê pejirandin. Ev peyman di Rêbendana 1951ê de dikeve meriyetê û heta niha 140 welatan ew peji-randiye. Di vê peymanê de têgiha *nijadkujiyê* (jenosîd) bi awayekî fermî tê pênasekirin. Her wiha di wê peymanê de *zimankujî* ango *qirkirina zimanî* (Linguicide, Linguistic Genocide) jî hatiye pênasekirin: “Zimankujî, qedexekirina bikaranîna zimanê komêkê/civakekê/gelekî ya di karên rojane de yan jî di dibistanan de yan jî di weşangerî û belavkirina wan weşanan de ye.” Li gorî vê peyman û pênaseyê, Skuttnabb-Kangas û Phillipson (1993) rewşa Kurdî jî wek ‘zimankujî’ yê pênase dikin.⁴

Dema ku mirov li van her du gotin û mînakên binihêre, mirov dê di girîngiya ziman bigihîje. Tê zanîn ku gava yekemîn a dagirkirina mêtî, xerabkirina kodên genetîk, ji xwebûnê dûrxistin û tunekirina *hebûnê* û mêtîngeriya zi-

4 Skuttnabb-Kangas, Tove&Phillipson, Robert, "Linguistic Human RightsfortheKurds," *TheKurdish People -No Futurewithout Human Rights* içinde, Ed. Ser-taç Bucak (Bremen: International Association for Human Rights in Kurdistan, 1993).

manî ye. Ev mêtîngerî jî bi awayê herî hêsan û berbelav bi perwerdehiyeke giştî pêkan e ku *perwerdehiya formal* a li Tirkîyeyê bi armanca bişaftina ziman û çandên din teşe girtiye. Ji bo xelasiya ji vê dehfikê, rizgariya ji vê bindestiyê û parastina xwebûn û hebûna xwe, xebatên ziman û perwerdehiyê ji bo gelê kurd divê berî her tiştî werin. Ji bo danîn û zexmkirina hîmê bîngêhîn ê li hemberî bişaftinê, parastina zimên, destnîşankirina armancên giştî û diyarkirina rêbazeke perwerdehiyê ya demildest divê û ev tişt jî tenê bi xebat û kargehên bi vî rengî pêkan e. Di encama van xebatan de girîngiya zêdekirin û berbelavkirina xebatên bi vî rengî bi awayekî zelal derket holê û her wekî ku dê li jêr bi awayekî berfireh bê vegotin, gelek agahî û belge jî hatin bidestxistin. Her çî qas di bîngêha tevahiya arîşeyan de polîtîkayên giştî yê dewletê hebin jî, hat dîtîn ku gelek pîrsgirêk û bendên cihêreng jî hene û li dijî van gelek rê û rêbazên çareseriyê jî hatine bidestxistin.

Pirsgirêkên Sereke yê Qadên Ziman û Perwerdehiya Kurdî

Bêguman dema ku kesek, komek, saziyek bixwaze di qada ziman û perwerdehiya Kurdî de xebatan bike bi gelek pîrsgirêkan re rû bi rû dimîne. Li gel ku pîrsgirêkên sereke yê herî mezin pîrsgirêkên bi serdestan re ne jî, gelek pîrsgirêkên navxweyî yê ku li pêşiya van kes, kom û saziyan jî ne hindik in. Ev arîşeyên ku têkildarî hev in, sedemên wan dişibin hev û ji hev dizên, dikarin bi gavên biçûk di demeke kin de bîna çareserkerin. Wek mînak gavên biçûk dikarin werin avêtin. Wekî: Sepana darsa hîlbijartî ya Kurdî bêyî guherînên di Destûra Bîngêhîn de û guherînên biçûk ên di sepanên wezaretên têkildar de. Bi van guherînên biçûk dê şiyarî û hin destkeftî çêbin.

Li gorî beşdarên civînên fokûskirî, kêşeya herî mezin a li ber ziman û çanda Kurdî ew e ku statûyeke fermî ya zimanê Kurdî tune ye. Ziman bi gotina feylesofê alman Martin Heidegger “Mala hebûnê” ye. Di vir de ev pîrs derdikeve pêş: Çawa maleke fermî ya vê hebûnê ya gelekî ku ji milyonan⁵ pêk tê, tune ye? Ew çawa dikare tune bê hesibandin? Çawa dikare bê tunekirin? Navê vî tiştî çî ye?

Ev yek jî ji bo dildar û parêzvanên ziman û çanda Kurdî pîrsgirêkeke din a girîng bi xwe re tîne ku ew jî ewlehî ye. Hewla parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî wek serhildêriya herî mezin a li hemberî hebûna dewleta Tirk tê dîtîn. Ev kesên ku di nava vê hewlê de ne tîna marjînalîzekirin, krîmînalîzekir-

5 Li ser hejmara kurdan a li Tirkîyeyê xebateke fermî tune ye. Li gel vê rapora Kondayê ya bi navê “KONDA Barometresi: Temalar (2015)”, rêjeya kurdan %16,5ê gelheya Tirkîyeyê ye. Akademîsyen Mehrdad R. Izady di pirtûka xwe ya bi navê *The Kurds: A Considered History and Fact Book* (London: Taylor and Francis, 1992, r. 342) de vê rêjeyê di nav %18,9-%24,1 hesab dike. Li gorî van hejmaran gelheya kurdan a li Tirkîyeyê di nava 13-20 milyonan de ye.

rin û heta terorîzekirin. Sazî û dezgehên ku bi salan li hemberî hemû kêmasî û kêmdarfetiyên bi zor û zehmetî, bi hewl û hêza xwe li ser pêyan mabûn, yê wêkî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Kurdî-Der, Komeleya Nivîskarên Kurd, Komeleya Dîcle Firatê û hwd rasterast bi hinceta “bûne/veguherîne navendên terorîzmê” bi yek derbê hatin krîmînalîzekirin, terorîzekirin û di çarçoyeva Rêveberiya Awarte de hatin girtin. Di van pênc salên dawîn de bi gelek sedemên cuda li gelek rêveber û endamên van saziyan doz hatine vekirin.

Yek ji saziyên sivîl ku karê perwerdehiya Kurdî dike Med-Der e ku li Amedê xebatên xwe didomîne. Li gorî rapora Med-Derê ya şeş-mehî (01.01.2020 - 01.07.2020)⁶ ku ji me re ji bo amadekirina vê raporê şand, Med-Derê ji ber rewşa covid-19ê bi rêya online kurs ji bo hînbûn û pêşvebirina Kurdî vekirine û di nava vê dema diyarkirî de, di 13 polan de nêzî 700 kesan beşdarî van kursan bûne. Her wiha li gorî rapora ku Komeleya Lêkolînên Kurdî ya li Stenbolê ji me re ji bo amadekirina vê raporê şand,⁷ Komeleyê bi rêya online du caran kurs ji bo hînbûn û pêşvebirina Kurdî vekirine ku ya yekem di 15.04.2020an de dest pê kiriye. Kursê yekem 1048 kes lê beşdar bûye û 895 kesan bi awayekî serkeftî kursê kuta kirine. Heçî kursê duyem e, Komeleya Lêkolînên Kurdî tevî saziyên din ew daye destpêkirin, 2073 kesan serî li kursê dane û 1654 kesan bi awayekî serkeftî kursê kuta kirine. Di raporên her du saziyan de jî tiştê herî balkêş ew e ku zêdetirî van kesan li wan geriyane, bi wan re têkilî danîne û xwestine beşdarî kursan bibin.

Polîtîkayên krîmînalîzekirina zimanê Kurdî bandorê li ser perwerdeya Kurdî dike ku ji hêla saziyên sivîl ve tîr çêkîrin. Em dikarin mînakê ji bo vê bandora neyînî bidin. Di raporên navborî de, kesên ku serî li kursên hînbûn û pêşvebirina Kurdî dane, bi hincetên wêkî “li zanîngehê xwendekar in, dibe ku bîrên dîrxistin/avêtin”, “dixwazin bibin karmend lê dibe ku ev kurs ji bo karmendiya wan bibe xetere”, “di malbata wan de karmendên dewletê hene û dibe ku ji ber hatina vê kursê xizmên wan ji kar bîrên avêtin” û hwd nexwestine ku navên wan bîrên tomarkirin, tîlefona wan bîrên qeydkirin an jî ji wan re e-mail werin şandin. Ji ber sedemên bi vî rengî beşdarî kursan nebûne.

Li cihê ku ev qas tîr û xof hebe, ne pêkan e ku pêşketineke bi hêsanî çêbibe. Ev yek bandorê li zanîngeh û dibistanan jî dike. Wêkî ku tê zanîn, piştî guherandina zagonan, di serdema perwerdehiya 2012-2013an de, dersên hîlbijartî yê Kurdî heftê du saetan, ji pola 5an bi şûn de were dayîn. Piştî vê gava *nejidil a*

⁶ Rapora Xebatan a Med-Derê (nehatiye weşandin) Amadekar: Li ser navê rêveberiya Med-Derê, Mirad Bilgîç, Amed, Med-Der, 2020

⁷ Rapora Xebatan a Komeleya Lêkolînên Kurdî-Derê (nehatiye weşandin) Amadekar: Li ser navê rêveberiya Komeleya Lêkolînên Kurdî, Eyyûb Subaşî, Stenbol, Komeleya Lêkolînên Kurdî, 2020

ku hat avêtin, li gorî agahiyên ku Wezaretê Perwerdehiyê ya Neteweyî ya Tirkîyeyê parve kirine, di serdema perwerdehiyê ya 2013-2014an de 53 hezar, di serdema 2014-2015an de 85 hezar zarokan dersa Kurdî hilibijartine. Tevî gelek bend û astengiyên teknîkî yên ku didan ber xwendekaran jî, dîsa bi hezaran kesan daxwaza dersa Kurdî kiriye. Lê li hemberî vê daxwazê li gorî daxuyaniya ku Însiyatîfa Mamosteyên Kurdî daye, li gel ku ji beşên Ziman û Wêjeya Kurdî yên li zanîngehan salê 100 kes mezûn dibin jî, di sala 2014an de 17; di 2015an de 9; di 2017an de 3 û di 2020an de jî bi tenê 2 mamosteyên Kurdî hatine peywardarkirin.⁸ Hinek ji van jî paşê bi biryar-fermanan (KHK) ji kar hatine avêtin.

Di rewşeke wiha de, ji ber vê nêrîn û hişmendiyê qadên ku Kurdî tê de tên bikaranîn her roj hinekî din kêm dibin. Dema ku qadên bikaranîna zimanekî bîstengkirin, pêdiviya bi wî zimanî kêm bibe, ji aliyê aborî ve jî ew ziman bêhêz dibe. Dema ku hêzeke aborî ya tiştê tune be, xwedîderketina li wî tiştî kêmtir dibe û ew tiştê kêmtir dibe. Bi du mînakên biçûk mirov dikare vê yekê pesend bike ku statûyek û hêzeke aborî ya ziman û çandekê hebe, xwedîderketineke li wan jî dê zêde bibe. Piştî ku di sala 2011an de li Zanîngeha Artûklûyê ya li Mêrdînê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî hate vekirin, di nava du hefteyan de ji 3000î zêdetir kesî serî li kursên Navenda Kurdî-Derê ya li Amedê dan.⁹ Dîsa bi zagona bi hejmarê 6411an a ku di 2013an de hat pejirandin, rê li ber xweparastina bi zimanê dayîkê yê li dadgehên vebû. Dewletê bi tu awayî xwe neda ber aboriya vî karî û barê aborî yê vê sepanê da ser milê “bersûcan”. Li gel vê yekê, ji bo kesên ku bikarin wergera di navbera Kurdî û Tirkî de bikin qadeke kar a nû vebû. Bi vê zagonê ji bo wergêriya di dadgehên de di nava hefteyekê de ji 2000î zêdetir kesî serî li dadgehên li Amedê dan ku wek wergêr bîstengkirin. Bi van mînakên jî xweş diyar dibe ku statûyeke zimanekî hebe, ji wî zimanî dahateke aborî bikare bê bidestxistin, baldarî û xebata li ser wî zimanî zêdetir dibe.

Li gorî beşdarên civînên fokûskirî, li gel van arîşeyên bîstengkirin ên derveyî, di xebatên qadên ziman û perwerdehiyê de gelek pirsgerêkan navxweyî jî hene. Ji van pirsgerêkan a sereke ew e ku plansaziyeke giştî ya ji bo ziman û perwerdehiyê ya kes û saziyên ku di van qadan de dixebitin tune ye. Xebatên ku tên kirin bê ser û ber in. Hem ji aliyê wan rêbazan ve ku tên bikaranîn û hem jî ji aliyê wan materyalan ve ku tên bikaranîn hevgerîneke xurt tune ye. Armancên ku ev xebat lê tên edilandin ji bo çareseriyên giştî ne, piralî û bîstengkirin in. Xebatên ku tên kirin di encama wan de ne diyar e ka dê dildar û xwebexşên van qadan kengê û çawa xwe bigihînin qonaxa dawîn.

⁸ Daxuyaniya ku di sala gelawêja 2020an de ji aliyê berdevkê Însiyatîfa Mamosteyên Kurdî, Mehmet Ay ve hat dayîn.

⁹ Hevdîtina rû bi rû li gel Serokê Giştî yê Kurdî-Derê yê wê serdemê Remzî Azîzoglu.

Piştî ku plansaziyeke xurt a giştî ya ku tê de armancên ku divê di demên kin û dirêj de bîdaxistin hat çêkirin, divê li gorî vê plansazî û armancên giştî pergaleke perwerdehiyê were çêkirin. Bi pergala perwerdehiyê ya heyî kopiyeye xerab a perwerdehiya serdestan e, ne pêkan e ku encamên çêker û bingehîn werin bîdaxistin. Ji bo ku pergaleke peverdehiyê were pêşniyazkirin/pejirandin, divê li ber destên mirov gelek dane hebin. Li gel ku hem di perwerdehiya nava malbatê de hem di perwerdehiya gelêrî ya li medreseyan de û hem jî perwerdehiya nûjen a ku bi salan e di nav gel de belav bûye, gelek ezmûnên girîng hene jî bîreke kolektîf ava nebûye. Ji ber vê yekê ezmûnên civakî nehatine arşivkirin û daneyên kêrhatî yên li ber destên kesên ku di qadên ziman û perwerdehiyê de dixebitin gelekî kêman in. Her wiha ji ber ku xebatên berfireh ên qadî jî nehatine kirin daneyên ku mirov bi wan rewşa rasteqîn a civakî bibîne û binirxîne tune ne. Her çî qas behsa asteke bişaftinê ya zimanî û çandî di nava gelê kurd de bê kirin jî, ji ber nebûna agahî, dane û îstatîstîkên teqez, tesbît û teşxîseke teqez nikare were kirin. Bêguman heger teşxîseke baş neyê kirin, tedawiyeke bingehîn jî ne pêkan e.

Heta ku tevahiya civakê ziman û perwerdehiyê ji xwe re neke xem, xwedîderketineke giştî çênebe, ne pêkan e ku bîr, pergal û plansaziyeke xurt jî çêbibe. Di vê meseleyê de beşdar bal dikişînin rol û rewşa aktorên siyasî. Di rewşa heyî de partî û siyasatmedarên xwedîhêz ji dil û can xwedî li ziman û çanda Kurdî dernakevin, parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî nakin yek ji armancên xwe yên sereke.

Li gel ku ziman û çand malên civakê ne jî, xebatên ku tên kirin di nava endam û dîwarên saziyan de asê dimînin, beşeke pir biçûk a civakê ji wan xebatan haydar dibe û beşdar dibe. Bi heman awayî sazî û dezgehên ku xebatên ziman û perwerdehiyê dikin jî bi tenê li hinek bajar û navendên mezin hene. Li gund, bajarok, navçe, taxên li qeraxên bajaran sazî û dezgehên ku karên ziman û perwerdehiyê dikin tune ne. Niştecihên li van deran ji derfetên kêman û kurt ên heyî jî bêpar dimînin. Weke mînak; Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ya ku di sala 1992yan de bi awayekî saziyê dest bi xebata li ser ziman û perwerdehiyê kiribû û di van qadan de otorîteya herî girîng bû, heta ku di 2016an de ji aliyê dewletê ve hat girtin li Stenbolê xebatên xwe didomand. Kesên ku li hinek navçe û taxên Stenbolê dijîn bi xwe jî heta ku bigihîştina wê saziyê û biketina dersekê diviyabû bi saetan rêwîti bikirina. Bi heman awayî, niha jî li Stenbolê Komeleya Lêkolînên Kurdî ya ku li ser ziman û perwerdehiya Kurdî xebatan dike di heman rewşê de ye.

Dîsa li gorî gelheya kurdan kêman bin jî, di navbera wan kes û saziyan de ku xebatên ziman û perwerdehiyê li cihên cuda dikin koordînasyoneke xurt tune

ye. Gelek caran ji hêz û xebatên hev bêpar dimînin, ezmûnên xwe bi hev naguherînin. Ev xebatên belawela dikin ku nakokî û nîqaşên zimanî û çandî zêdetir bibin.

Çawa ku saziyên ziman û perwerdehiyê yên kurdan ji hev cuda û bêhay karên xwe didomînin, bi heman awayî ji xebat û ezmûnên cîhanî jî bêhay in. Gelek serpêhatî û ezmûnên cuda li cîhanê çêbûne. Xwegihandina bi wan ezmûnan hêsantir jî bûye. Lê mixabin hewlên di vî warî de gelekî kêmtir û lawaz in.

Dîsa ji ber sedemên ku li jor hatin vegotin, xebatên di qadên ziman û perwerdehiyê de bi xwebexşî û fedakarî tînin kirin û aboriya wan qadan jî bi pêş neketiye. Nebûna aboriyeke xurt, bi taybetî dike ku derfetên xebatên li ser ziman û perwerdehiyê li bajaran kêmtir bibin. Ev yek dike ku pirsgerêkên cih, materyal, kadro û hwd zêdetir bibin. Bi taybetî ji ber qelsbûn û kêmbûna materyalan kesên ku dixwazin hînî ziman bibin jî nikarin zêde pê de biçin. Ji ber ku li gorî bal û hezên taybet materyal nehatine amadekirin, gelek kesên ku bi hêviyên mezîn berê xwe didin ziman û perwerdehiya Kurdî, piştî demeke kin jê sar dibin û dûr dikevin. Perwerdehiya ziman divê di temenên biçûk de dest pê bike. Lê mixabin piraniya materyalên perwerdehiyê li gorî mezînan hatine amadekirin.

Her wiha li gel pergaleke perwerdehiyê ya giştî, ji bo berbelavbûn û standardîzasyona di zimên de yek ji tiştên herî girîng jî çapemenî ye. Pergaleke perwerdehiyê ya berbelav a giştî ya kurdan tune ye. Lê çapemeniyeke xurt a kurdan heye ku her kes, li her derê dikare xwe bigihînin. Mixabin ji ber ku di çapemeniya giştî ya kurdan de ziman ne wekî armanc û hêmayeke bingehîn a hebûnê, lê wekî amûreke siyasî tê dîtin, çapemeniya giştî vê peywira xwe ya girîng nabe serî. Pirsgerêkeke din ew e ku zimanê çapemeniya kurdan bi giranî zimanê wergerî ye û ev werger jî şikestî û lawaz e. Ev jî dike ku zimanê wergerî yê şikestî û lawaz bibe serdest di zimanê çapemeniyê de.

Çend Mînakên Bînpêkirina Mafên Zimanî

Mixabin tu rojek tune ye ku di çapemeniyê de nûçeyeke nû dernekeve û bi awayekî êrîşek li ser zimanê Kurdî çênebûbe. Li bajarên Kurdistanê çawa ku bi destê parêzgar û qeyûman her roj tabelayên bi Kurdî tînin daxistin û navên kuçe, kolan û parkan tînin guherandin, li bajarên Tirkîyeyê yên ku gelheya Tirkan zêde ye jî her roj ji ber sedemên cur bi cur êrîşên cur bi cur li ser kurdan çêdibin, qedexeyên sosret tînin danîn û hwd. Carinan ji ber guhdarîkirina straneke bi Kurdî li kuçeyan, carinan ji ber axaftina di tîlefônê de ya bi Kurdî di

otobês û metroyan de kurd rastî êrîşan tên. Di girtenameyên parlamentoya Tirkîyeyê de peyvên bi Kurdî wek 'xxxxxx' tên tomarkin. Di serdegirtinên malan de pirtûkên Kurdî yên ku bi destûra Wezaretê Çandê hatine çapkirin wek delîlên sûc tên binavkirin û bikaranîn û hwd. Ew lîste her roj hinekî din dirêj dibe. Hincetên êrîşan hinekî din sivik dibin, kirinên dermîrovî hinekî din giran dibin. Em ê li vê derê bi tenê çend mînakên ku bi giranî bi saya medyaya civakî hinekî be jî ketin rojevê bidin:

01.06.2020: Ciwanê bi navê Barış Çakan (20) ê ku ji navçeya Patnosê ya Agiriyê ye, ji ber ku li muzîka Kurdî guhdarî dikir, li Taxa Alsancakê ya Etfimesgûta Enqerê rastî êrîşekê hat û di saet 22:30an de hat kuştin.¹⁰

08.08.2020: Li gundê Satya yê navçeya Sûra ser bi Amedê, leşkeran mewlîda Kurdî ya ku mela dixwend, di nîvê de birî û hişyariya "Tu yê mewlîdê bi Tirkî yan jî bi erebî bixwîn" kir.¹¹

27.04.2020: Li Wanê, wexta ku mamosteyekê xwest ku bi rêya pergala (EBA)yê ya ku piştî şewba vîrûsa koronayê ji bo perwerdedayîna xwendekaran hat vekirin, bernameya ders û fealiyetan ji xwendekara xwe ya bi navê Jiyanê re bişîne, pergala EBAyê ji bo navê Jiyanê got, "Metna ku hûn dixwazin bişînin tê de peyvên neguncaw û qedexekirî hene, ji ber vê yekê hûn nikarin bişînin." Mamosteyê ku heya demeke dirêj tu wate neda vê rewşê, piştî nû ferq kir ku navê Jiyan bi Kurdî ye û ji ber vê yekê daxwaza wê hatiye redkirin.¹²

26.02.2020: Hate diyarkirin ku li Girtîgeha Eskîşehîrê, di hevdîtînan vekirî de axaftina bi Kurdî hatiye qedexekirin û gardiyan û polîsan pevra avêtine ser qawîşan. Her wiha îdareya girtîgehê ji bo notayên muzîkê yên hatine şandin jî gotiye "bişîfrekirina rêxistinî" ye û ew qedexe kiriye.¹³

21.02.2020: Bîst û du parlamenterên HDPê bi minasebeta 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê bi Tirkî, Kurdî (Kirmanckî, Kurmancî), erebî û suryanî pirsname û pêşniyarnama dan parlamentoya Tirkîyeyê lê parlamentoyê di Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanê de pêşniyarnama û pirsanemyên HDPê yên bi zimanê Kurdî, Erebi û Suryanî red kirin.¹⁴

10 <https://e-rojname.com/bs-kirmancki/86362/>

11 https://bakur.tv/esker-mewlida-kurdi-di-nivide-biri-yan-bi-tirki-yan-ji-bi-erebi-bixwine/?utm_source=dlvr.it&utm_medium=facebook

12 <https://dokuz8haber.net/gundem/eba-jiyan-ismini-kabul-etmedi/>

13 <http://mezopotamyaajansi22.com/kr/search/content/view/87168?page=38&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3?page=1&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3>

14 <http://mezopotamyaajansi22.com/kr/search/content/view/86694?page=40&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3?page=1&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3>

29.01.2020: Platforma Tenduristiyê ya Amedê têkildarî xizmeta bi zimanê Kurdî ya tenduristiyê daxuyanî da û diyar kir ku mafê zimanî di xizmetên tenduristiyê de tê bînpêkirin û xwest ku bikaranîna zimanê Kurdî li qada tenduristiyê demildest bikeve meriyetê.¹⁵

13.01.2020: Parlementera HDPê Meral Daniş Beştaşê diyar kir ku li Bala-firgeha Stenbolê 36 ziman û 80 zarava hene, lê di nava xizmeta wegerê de Kurdî tune ye. Beştaşê mijara tunebûna Kurdî bire rojeva parlemantoyê.¹⁶

15.10.2020: Lîstika şanoyê ya bi Kurdî bi navê *Bêrû* li gel ku hemû bilêt hatibûn firotin û amadekariya pêşandanê hatibû kirin, di gava dawîn de ji aliyê Qeymeqamiya Gazîosmanpaşaya Stenbolê ve hate qedexekirin. *Bêrû* navê Kurdî ya lîstika şanoyê ye ku ji aliyê nivîskarê îtalî Dario Fo ve hatiye nivîsandin. Teatra Jiyana Nû jî bi salan e vê lîstikê dilîze. Di sala 2018an da, di Festîvala Şanoyê ya Moskovayê da wekî lîstika herî serkeftî hatiye hilbijartin û Teatra Jiyana Nû jî bi Xelata Sereke hatiye xelatkirin. *Bêrû* di nav bernameya Çalakiyên Çandî ya Şaredariya Bajarê Mezin a Stenbolê da cih girtibû û eger ku nehata qedexekirin, di dîroka Şanoyên Bajêr a 106 salî ya Stenbolê de cara yekemîn lîstikeke şanoyê bi zimanê Kurdî dê bihata pêşandin.¹⁷

01.08.2020: Bi hinceta ku tezên ji bilî zimanê Tirkî têne nivîsandin divê Desteya Bilind a Xwendinê li ser biryarê bide, Zanîngeha Dîcleyê li Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya wê zanîngehê nivîsandina teza bi Kurdî qedexe kir. Rêvebiriya Zanîngeha Dîcleyê ji xwendekarên xwe xwestiya ku têza xwe bi zimanê Tirkî binivîsin.¹⁸

Pêşniyazên Çareseriyê

Her wekî ku li jor pirsgirêkên ziman û perwerdehiya Kurdî weke pirsgirêkên derveyî û navxweyî hatin cudakirin û vegotin, ji bo çareseriyê van pirsgirêkan û parastin û pêşvebirina Kurdî jî divê bi du awayan li meseleyê bê nihêrîn. Asteng û pirsgirêkên herî mezin û bingehîn ên ku li pêşiya Kurdî ne, ji ber nêrîn û polîtîkayên taybet ên pişêvkar û tunekar ên dewletê ne. Heta ku ev nêrîn neyê guhertin û di çarçoveya mafên mirovî yê bingehîn de statûyek ji bo Kurdî neyê bidestxistin, xebatên navxweyî çî qas xurt bin jî dê her tim lingekî wan li hewa bi-

15 <http://mezopotamyaajansi22.com/kr/search/content/view/84102?page=45&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3?page=1&key=75b81b8ce9591da6152f43158584fac3>

16 <http://www.rupelanu.com/li-balafirgeha-stenbole-36-ziman-u-80-zarav-hene-le-kurdi-tune-cima-9045h.htm>

17 <https://www.gazeteduvar.com.tr/beru-ya-ji-durutiya-dewlete-haber-1501772>

18 <https://www.rudaw.net/kurmanci/kurdistan/0108202015>

mîne. Dewlet divê berpirsiyariya xwe ya li hemberî hemwelatîyên xwe demildest bi cih bîne. Dûreparêziyên ku li peyman û daxuyaniyên navneteweyî yên derbarê mafên mirovan de daniye, divê demildest rake. Divê li gor peyman û daxuyaniyên ku destnîşan kiriye tevbigere û ji bo hemû hemwelatîyên li Tirkîyeyê şert û mercên wekhev û demokratîk biafirîne.

Ji ber polîtîkayên bişaftinê yên ku heta niha sepandine gelê kurd jî tê de ji hemû gelên din lêborînê bixwaze. Wekî ku li jor jî hatiye destnîşankirin, Komara Tirkîyeyê di rewşa îroyîn de li dijî Kurdî û zimanên din ên ne Tirkî *zimankujiyê* (linguicide) pêk tîne, divê dest ji vê zimankujiyê berde û ji bo ziman û perwerdehiya (bi) Kurdî di hemû polîtîkayên xwe û xebatên xwe de cudakariya erênî pêk bîne û teşwîq bike. Divê bi awayekî lezgin zagon bèn guherandin, rewşeke aram û biewle were bidestxistin da ku ev hişmendiya li hemberî Kurdî ku bi salan e dewletê bi awayekî sistematîk afirandiye vegehirîne û polîtîkayên qedexekirin û krîmînalîzekirina Kurdî bi dawî bike. Ev yek wê bike ku li hemberî Kurdî rêzdarî û sempatiyek çêbe, atmosfereke guncaw ji bo bikaranîna Kurdî û perwerdehiya bi Kurdî bê afirandin û rewşa xeternak a ku Kurdî tê de ye bê berevajîkirin.

Dema ku ev guherîn û veguherîn tên çêkirin, divê ji ezmûnên kes û saziyên ku bi salan li ser Kurdî xebitîne sûd were girtin û kurd bi xwe biryara 'çî' û 'çawa'ya divêtiyan bidin. Ji bo ku plansazî û bernamêyên ku ji aliyê kurdan ve bèn amadekirin bèn sepandin, divê dewlet di serî de pêkanîna şert û mercên aborî û fîzîkî hemû berpirsiyarî û peywîrên xwe bi cih bîne.

Li gel reformên siyasî ku lazim e dewlet pêk bîne, divê kurd berî her tiştî zimane xwe wekî hebûneke neteweyî bipejirînin û xwedîderketina li zimên weke peywîreke neteweyî bibînin. Bi nêrîn û vîzyoneke teng li zimên neyê nêrîn û hişmendiya qada siyasî ya kurdan a li hemberî Kurdî were guherandin. Divê sazi û dezgehên kurdan bikin ku hişmendiya xwedîderketina li zimên di nava gel de belav be û kar û barên xwe yên zimanî ku di saziyan de û li hinek taxên navendî yên hinek bajarên mezin asê mane berbelav bikin.

Ji bo koordînekirina xebatên hemû kes û saziyên ku karên ziman û perwerdehiya Kurdî dikin divê saziyeke sîwanî ya ji bo Kurdî bê damezirandin. Di bin banê vê saziyê de divê tavilê plansaziyeke giştî ya demkurt û demdirêj were çêkirin û li gorî rewşa xwereng ku kurd niha tê de ne, li gorî çand, erdnîgarî, kişwer, dîrok, ezmûn, derfet û hwd pergaleke perwerdehiyê bê amadekirin.

Ji bo ku pergaleke giştî ya perwerdehiyê were diyarkirin û plansaziyeke xurt were çêkirin, bêguman divê hem xebatên qadî yên weke kargeh, semîner, nîqaş, rapirsîn û hwd bèn kirin ku bi wan tesbîta rewşê baştir were kirin û asta bişaftinê çêtir were dîtin.

Di serî de ji bo zarokan, li gorî şert û mercên jiyane yê îroyîn, divê materyalên perwerdehiyê werin amadekirin. Ezmûnên weke Dibistanên Azad, Malên Piştgiriya Perwerdehiyê, Zarokistan, Akademiyên Cegerxwîn, Aram Tîgran û Nûda bîn xurtkirin û hêza navxweyî ya kurdan were bidestxistin. Ji bo xurtkirina hêza heyî û bi awayê herî hêsan berbelavkirina xebatên ku tên kirin, divê bi çapemeniya kurd re hevkarîyeke xurt were çêkirin. Çapemenî ji zimanê wergerî were rizgarkirin, zimanê çapemeniyê were sererastkirin, bêhtir xebat ji bo zarokan werin kirin û hwd.

Her çî qas kêr û kurt bin jî, niha di nava pergala perwerdehiyê ya giştî ya li Tîrkiyeyê de du qad ji bo Kurdî vebûne. Yek jê beş û polên ku li zanîngehan hatine vekirin, ya din jî dersên hîlbijartî ne. Ji bo balkişandina van destkeftiyan û beşdariyeke xurt li dersên hîlbijartî dikare kampanya û xebatên agahdarkirinê werin lidarxistin. Heger beşdariyeke xurt li van xebatan çêbe, dê daxwaza perwerdehiya bi Kurdî berbelav bibe û dewlet neçar bimîne ku gavan bavêje.

Wek Encam

Di vê rapora li ber destên we de, me hewl da ku bi awayekî kurt çarçove-yeke giştî ya rewşa ziman û perwerdehiya Kurdî ya li bakurê Kurdistanê vebêjin. Ji bo vê xebatê du civînên fokûskirî yên bi aktor û aktîvistên ziman û perwerdehiya Kurdî re me ji xwe re kir bingeh. Li gel wan civînan ku li ser înternetê hatin kirin, lêkolînan qadî û hevpeyvînan rû bi rû jî ji vê raporê re bûn çavkanî. Me hewl da ku em girîngiya perwerdehiyê, di asta xwecihî û navneteweyî de mîsyona ku li vê qadê û xebatên wê tê barkirin, pirsgirêkên sereke yên di vê qadê de, kêşe û astengên li ber aktor û aktîvistên vê qadê, pêşniyazên çareseriyê yên giştî bi hinek mînakên vebêjin.

Rêya herî teqez û hêsan a parastin û pêşvebirina zimanekî perwerdehiyeke berbelav a bi wî zimanî ye. Perwerdehiya berbelav û gelemperî bi xwe re statûyekê tîne. Heger statûyek ji bo tiştêkî hebe, ew tişt qadeke aboriyê jî diafirîne. Heger ji tiştêkî xwedîbûnek, debarek çêbibe, xwedîderketineke xurttir çêdibe, tirs û qidûmên şikestî ji holê radibin. Heger li qadekê xetereyek, çavkaniyeke tirsê tune be, xwedîderketineke kolektîf bêhtir çêdibe. Xebatên kolektîf bi xwe re bername û plansaziyên giştî tînin. Bername û plansaziyên giştî pêdiviya bi materyalên nûjen, hevpar çêdikin. Ev pêdivî berê xebatkar û xwebexşên qadî didin ezmûnên borî, ezmûnên borî di bîrekê de tên tomarkirin, sûd ji wan tê girtin, xwenasîn û xwezanîn çêdibe. Xwezanîn û xwenasîn bi xwe re xwehezî û jixwebaweriyê tînin ku ew jî agirê xwedîderketina li xwe geştir dikin û serkeftinê nêzîktir dikin. Ev jî jixwe dike ku her du aliyên vê bazinê ku ji van keresteyan pêk tê bigihên hev. Serdest û peywirdar neçar bimînin ku bibin alîgir û piştgirên peyman û daxuyaniyên navneteweyî û wan biparêzin. Ev yek jî jixwe yek ji keresteyên bingehîn ên vî karî statûyê diafirîne.



Web: www.torakurdi.org
E-mail: info@torakurdi.org